

AGIRÊ NEWROZÊ

Canşêrê Cinciqê

Em li herêma Efrînê , gundê Çeqela bûne mîvan , da ku , em û zarokên xwe cejna **NEWROZÊ** ,li wir bikin . Efrîn buhuşta zemînê ye, Newroza wê pir xweş e, û sîmfoniya Buharê ye.

Şemiyê \ 20 \ Avdarê \ 2010 an , me çend navseran – bi alîkariya xortên gund – agirê Newrozê li ser çiyê dada , û li dorê çepik ,stran û dîlanokek gerand...Piştê em daketin mala mazûvanê xwe , Bavê Mehabad , ew jî , hevalekî minî , ku em ji zû ve têkildarê hev in .

Li ber mala wî, gundî civiyan û govenda êvara Newrozê li ber dengê dahol û zurnê li dar xistin. Govendeke pir xweş û geş bû , û bi rengên Buharê hatibû xemlandin.

Piştî govend – bi xêr – bi dawî bû , em komek jin û mêr , li malê , rûniştin , û guftûgo li ser Efrîn û Cezîrê vebû , min jî xwest berê pirsê bidim wan , û min got : Agirê Newrozê li Cizîrê – dema berê – pir bi zehmet û metirsî dihat dadan ,û pir kes ji bo wê zindan û eşkence dibûn, helbet li Efrînê jî wilo bû, ma ne?.

Kalek li hember min rûniştibû got: Belê wele xarzî rast e, li Eefînê jî hana (wilo) bû, ka ez çîroka rehmetî birakê xwe Ehmedê Hecfilik bêjim: Ez karim bibêim ku, ew û herdu rehmetî - Mihemed Bekirê Mamedê(Mijo) û Heyderê Êhoyê Mamedê-ev her sê li gundê me Çeqela, di Partî de xelesa yekê bûn , birayê min Ehmed û herdu hevalên xwe, li rêka heps û zindanan diçûn dihatin . wan ji sala 1960î ve û berî wê, dest bi karê KURDAYETIYÊ kirine... Van camêran her Newroz Agir pêdixistin ,ji ber wê jî pir caran hatin girtin û ,polîsan ew dan bin çu û kotekan .

Xalo berdewam kir : Piştê polîs ferman da ku, ev çend kes ,êvara

Agiran , wê li ((Mexferê)) , yan li mala Mixtêr ,wê xewkin.... Ne şaşim Newroza 1961ê bû ,êvara agiran Ehmedê me ji mal derket ,ji dê û bavê xwe re got: Diçim mala Mixtêr , sibe Newroz e ..Lê ew diçû êgir dade , bi rêve rastî Ehmedê zîno tê – ew jî gundiye-jêre dibê : Here rûne , derim avekê birjînim û têm –hema li pêşiyê kembera xwe sist dike ... Roja din sibê polîs hatin, gundî komkirin û pirsîn: Kê Agirê QUZELQURT a Newrozê dadaye?.. Kes li xwe mukur nehat .. Paşê kemberek piştê raber kirin û gotin: Ev ya kê ye ? ..Dîsa kes mukur nehat , lê min û Ehmedê Zîno naskir ku ,kember ya Ehmedê me ye –ji leza re li şûna xwe , li ber êgir hiştibû- me zanî yê ku, agir dadaye Ehmed e !!.. Polîs , nişkave ,piyê xortekî girt û gêkir û bi zirt çu rakire jor û got : Welah emê we gişan bidin bin çîwa, ta em naskin yê agir dadaye kê ye!... Wê gavê , yekî bankir : Bisekinin , bisekinin , Ez im û kember jî ya min e (Ehmedê me bankir)...

Xalo keserek mêranî kişand û got : Van bêbavên ŞURTE , EHMED dan ber ,çov ,sîle û pehnan û ew birin. Lê hîn dengê wî di guhên min de ye dema ji min re digot : Memo, keko metirse ezê vegerim ,û, şiyandin zindanê, ji du heyvan bihtir -wê carê- di hepsê de ma... Xalo bihna xwe berda û got : Rehmetî \ 35 \salî çu rehmetê. Ez dibêjim nexweşiya wî ji zindan û kotekên pir bû .. Îcar , xwarzî!.. Agirê Newrozê, li cî yê û bi germiya dilên xebatkaran gur bûye.

Ehmedê Hecfilik•Xebatkarekî ji gundê Çeqela-Herêma Eefrînê, sala 1944an li wir bûye,,1960î yan berî wê ketiye nav refên Partî , û ma endam , ta 17\12 \1979 an, koç barkir, û li goristana Cindirêsê hat veşartin.

Mihemed Bekirê Mamedê (Mijo) û Heyderê Êhoyê Mamedê : Du xebatkarb û ji gundê Çeqela bûn .. Milo , berî çend salan , termê wî yê pîroz ji Ewoipa hat , û li Çeqela hat veşartin.